Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :751 11-Nîsan- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li Şehbayê Metirsî Duqat e!

Idrîs Henan

Herêma Şehba yek ji herêmên ku bi salan rastî talanî, wêranî û qirkirina çeteyên DAIŞ, El Nusra û hemtayên wan hatiye. Bi hezaran laşên çeteyan û mexdûrên komkujiyên ku



bi destê wan pêkhatine, li vê herêmê rizîne. Ji lew re herêma Şehbayê heya çarîka yekem a sala 2018`an weke herêmeke halketî û jêdera nexweşiyan bû. Li kêleka gefûgurên dagirkeriyê xwezaya Şehbayê ya ku hatiye texrîbatkirin şantajek zêde li ser jiyana şêniyên Efrînê çêdikir. Li beramberî bêdengiya sazî û rêxistinên navneteweyî yên têkildarî rewşa tendirustî û koçberan, saziyên Rêveberiya Xweser ketin dewrê û li gorî derfet û îmkanan herêm hate paqijkirin. Lê dîsa jî bi dorpêça artêşa rejîma Sûriyê, dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ev herêm heya roja îro rûbirûyî karasatên tendirustî û metirsiya qirkirinê ye. Îro jî bi belavbûna vîrûsa koronayê re ev metirsî duqatî bûye ku herêma ji her alîkariyeke mirovî mehrûm maye, rûbirûyî pêketineke xeternak a bi vîrûsa koronayê re ye.
Ji bo rêgirtina li ber xeteriya pêketina bi vîrûsa koronayê Meclîsa Rêveberiya herêma Efrînê paralelî biryarên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê şaneya kirîzê ava kir û di 23 Adara derbasbûyî de qedexekirina derketina derve îlan kir. Rojnameya Ronahî li kampên koçberên Efrînê li Şehbayê geriya û di derbarê rewşa awarte de pabendbûna gel, kar û xebatên saziyên rêveberiyê ji nêz ve şopand û ev rapor amade kir.

## Rojê Sê Danan Kamp Tê Temîzkirin

Endamê rêveberiya şaredariya Kampa Berxwedan Welîd Miho diyar kir ku; kamp rojane sê danan bi dermanê paqijiyê yê li dijîn mêş, kurm, mor û megezan tê reşandin û paqijkirin. Miho wiha dewam kir: “Bi ragihandina rewşa awarte re şaredariyê dest bi temîzkirina sazî, dezgeh, dibistan û navendên fermî kir. Pişt re kamp û derdora kampê bi giştî bi madeya klorê hate temîzkirin. Li kampa Berxwedan 50 laperên serşok û avdestxaneyan hene. Kortikên wan ku 35 in, rojane tên valakirin. Ev laper rojane sê caran bi klorê tên şoştin û temîzkirin. Her wiha bi giştî kamp û derdora wê her sê rojan carekê tê reşandin. Girêdayî mesela paqijiyê daboyên avê her 15 rojan carekê tên paqijkirin û tîmên taybet paqijiya ava vexwarinê kontrol dikin”.

## Madeyên Paqijiyê Li Gel Tên Belavkirin

Miho destnîşan kir ku ji bo konên koçberên Efrînê û paqijiya kesayetî jî madeyên taybet “klor, lodalîn, sabûn,.. hwd” li gel hatin belavkirin ku bikribin çadir û derdora xwe temîz bikin. Miho di vê derbarê de wiha axivî: “Ji bo tekûzkirina tedbîran li hemû endaman ku 53 kesan derbas dikin, devpoşî, lepik û cilên taybet hatine belavkirin”. Miho di dawiyê de bi bîr xist ku hemû endamên şaredariyê bi alîkariya endamên tendirustiyê û meclîsa rêveberiya kampa Berxwedan ji bo pêkanîna perspektîvên şaneya kirîzê û parastina gel, 24 saetan serferber in.

## Perwerde, Civîn Û Semîner Hatin Lidarxistin

Ji aliyê xwe ve Rêveberê noqteya Heyva Sor a Kurd li Kampa Berxwedan Dr. Hesen Nebo ev tişt anî ziman: “Ji bo têgihaştina xeteriya pêketina bi vîrûsa koronayê, di serî de endamên me hatin perwerdekirin. Ji bo gel, meclîs û komînan semîner û sînefizyon hatin pêşkêşkirin. Dîsa bi rêya erebeyan li tevahî herêma Şehba û Şêrawa gel bi deng hate hişyarkirin ku pabendê talîmatên şaneya kirîzê bin”. Dr. Nebo ragihand ku Heyva Sor a Kurd girêdayî biryarên şaneya kirîzê dergehên bi Şehbayê re xisitin bin kontrola tîmên tibî. Kesên rewşa wan bi guman be, derhal vediguhêzin nexweşxanê”.

## Ketin Û Derketin Qedexe Ye

Dr Hesen Nebo da zanîn ku rewşa kampên koçberan hestiyar e. Ji lew re asta tedbîran hê bilindtir e. Dr. Nebo wiha dewam kir: “Ji bo parastina şêniyên li kampan, berî her tiştî hatin û çûyîna kampan hate qedexekirin. Navenda me li Kampa Berxwedan 24 saetan li ser kar e. Lê tenê rewşên lezgîn pêşwazî dike. Hemû kesên dikevin kampê bi alava pîvana pila germê tên kontrolkirin”.

## Saziyên Têkildar Tu Destek Nedane

Rêveberê Navenda Heyva Sor a Kurd li Kampa Berxwedan Dr. Hesen Nebo di dawiyê de eşkere kir ku hemû tedbîrên li Şehbayê seretayî ne û hewce bi madeyên tibî yên temîzkirinê û alavên pêşketî heye. Dr. Nebo wiha dawî li gotinên xwe anî: “Her kes dizane ku Şehba di bin dorpêça hêzên rejîmê, dagirkeriya Tirk û çeteyên wê de ye. Derfetên wê kêm in û jiyana



mirovan di bin gefa pêketina bi nexweşiyan e. Tevahî tevgerîna me li gorî derfetên heyî ne. Pêdiviya me bi madeyên paqijî û temîzkirinê yên bi bandor heye. Her wiha alavên me ji bo rewşeke awarte têrê nakin. Ji lew re em bang li sazî û rêxistinên têkildar dikin ku bi lez alîkariya koçberên Efrînê û şêniyên Şehbayê bikin ku rê li ber belavbûna vê vîrûsê bigirin”.

## Komîteyên Tendirustiyê Seferber In

Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kampa Berxwedan Şêxo Îbrahîm diyar kir ku meclîsa



kampê bi desteka komîn û komîteyên tendirustiyê bi hevsengiya bi saziyên têkldar re di nav seferberiyê de ne. Şêxo wiha got: “Bi ragihandina rewşa awarte re komîteyên me yên tendirustiyê derbasî nava konan bûn û civînên danasîna girîngiya xweparastina ji pêketina bi vîrûsa koronayê ji nişteciyên kampê re lidarxistin. Kesên ku pabendbûna wan lawaz e, nîqaş pê re tê kirin û girîngiya xwedîderketina li biryarên şaneya kirîzê pê tên fêmkirin”.

## Hemû Pêdiviyên Gel Bi Cih Tên

Şêxo îşaret bi keda komîn û meclîsan kir û got: “Hemû endamên me di nav kampê de ne û rewşa gel ji nêz ve dişopînin. Pirsgirêkek li kuderê hebe destek didin”. Şêxo di dawiyê de jî bang li hemû gel û bi taybet nişteciyên kampê kir ku; pabendê biryarên şaneya kirzî bin û zarok, malbat û xwe ji encamên pêketina bi vê vîrûsê biparêzin”.
Hêjayî gotinê ye ji bo rêgirtina li ber berbelavbûna vîrûsa koronayê û parastina jiyana gel, Rêveberiya Xweser di 19 Adara derbasbûyî de ji bo 15 rojan rewşa awarte û qedexekirina derketina derve ragihand. Lê ji ber dewama metirsiya li ser jiyana mirovan, Rêveberiya Xweser di 7 Nîsanê de ji bo 15 rojên dîtir qedexekirina derketina derve dirêj kir.

## Xwendekarên ji Şamê hatîn testa “KIT” kirin û wê bikevin karantînayê

Li derdora 100 xwendekarên ji herêma Cizîrê ku li zanîngehên Şamê dixwînin gihîştin balafirgeha bajarê Qamişlo. Tîmên awarte yên Desteya Tenduristiyê ya Herêmê Cizîrê testa “KIT” ya keşifkirina vîrûsa Koronayê ji wan re çêkirin. Piştî ku test bi dawî bibe wê xwendekar 14 rojan di karantînayê de bimînin. Endama Rêveber a Desteya Tenduristiyê ya Herêma Cizîrê Rojîn Ehmed diyar kir ku navnedên karantînayê yên xwendekaran bi alav û pêwîstiyên lojîstîk hatine amadekirin. Piştî teqez bû ku bi vîrûsê neketine wê ji



karantînayê werin derxistin. 7‘ê Nîsanê hin rêwî ji Şamê gihîştin balafirgehê, berpirsên balafirehê yên girêdayî rejîmê hin kes ji karantînayê revandin.

## Hemîd El-Ebid: Artêşa Tirk a dagîrker nexweşên Koronavîrûsê dişîne Girê Spî

Hevserokê Meclisa Kantona Girê Spî Hemîd El-Ebid di hevdîtina xwe ya bi ANHA`yê re got; artêşa Tirk a dagîrker nexweşên Koronvîrûsê ji Tirkiyê tîne bajarê Girê Spî. El- Ebid diyar kir ku armanc ew e ku jimara nexweşên li Tirkiyê kêm bike.
El-Ebid hinek agahiyên ji çavkaniyên pêbawer bi dest xistine par ve kirin û got;
“Agahî rast in, bi taybetî piştî ku dagîrkeran hinek malên sivîlan veguherandine karantînayan ji bo nexweşên tîne herêmê. Ew nexweş ne ji Sûriyê ne. Ew nexweş tirk in.”
El- Ebid da xuyakirin ku artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê li herêmê siyaseta guhertina demografîk dimeşînin, şêniyên resen didin koçberkirin û



malbatên çeteyan li şûna wan bi cih dikin.
El- Ebid di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Çeteyên ku Tirkiye desteka wan dike û niha li Serê Kaniyê û Girê Spî ne, bi xwe çeteyên DAIŞ`ê ne. Lê navên cuda lê kirine. Li cem me zêdetirî 140 navên çeteyên DAIŞ`ê hene. Ev çete niha di nava qaşo Artêşa Niştîmanî ya Sûriyê, de ne.”

## Meclisa Kantona Qamişlo alîkariya malbatên xizan dike



Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo alîkariya welatiyan di gel rewşa qedexeya derketina derve, dayîna fatoreyên av, kehrebe û paqijiyê heta 2 mehan (Gulan û Hezîran) betal kirin û biryara belavkirina madeyên xwarinê li welatiyan da. ***R-2***

## Jinên YPJ şirîkên azadiyê ne



Li seranserê dinyayê jinên YPJ´yî bûne mînaka hêz û azadiyê, bandor li jinên cîhanê kirine û ji wan re nîşan dane ka jin dikarin çiqas şer bikin û xwe biparêzin. ***R-3***

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 751 11-Nîsan- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Erzîncan: Civak bi serê xwe dikare xwe ji vê vîrûsê xilas bike



Endama Koordînasyona KJK’ê Besê Erzîncan got; ‘’Dewletan xwest Koronavîrûs belav bibe. Civak bi piştgiriyê dikarin ji vê belayê xilas bibin.’’ ***R-4***

# “Emê bikarin vê pêvajoyê derbas bikin”



***Endama*** Desteya Rêveber ya PYD´ê Foza Yûsif diyar kir ku şer û êrîş xetera belavbûna nexweşiyê zêde dikin û pêşî li tedbîran digirin. Ji ber wê Neteweyên Yekbûyî bang li her kesî kir, lêbelê dewleta Tirk guh nade vê bangê. Gihîştiye wê radeyê ku bombeyan li stasyonên avê bibarîne. Bi şer û siyaseteke bêexlaq dixwaze vîrûs li vir jî belav bibe û rê li ber felaketekê veke. Heta niha çete bi kar dianîn, niha jî dixwaze vîrûsê bi kar bîne.” ***R-4***



## TEV-DEM li Qamişlo pakêtên xwerek li hewcedaran belav dike

TEV-DEM’ê ji ber qedexeya derketina derve ji ber Koronavîrûsê, pakêtên xwerek li xizanên Qamişlo, Dirbêsiyê û Amûdê belav kirin, wê li xizanên Dêrik, Til koçer, Til Hemîs û Çilaxa jî belav bike. ***R-5***

## Daxwaziya girtina agahiyan ji Îmralî hat redkirin

***Parêzerên Rêber Abdullah Ocalan*** ji bo girtina agahiyan û axaftina bi telefonê serlêdan kirin. Lê serlêdan hat redkirin. ***R-4***



## “Êrîşên Tirkiyê têkoşîna li dijî vîrûsê asteng dikin”



Hevserokê Bûroya Parastinê ya Rêveberiya Xweser Zeydan El-Asî hişyarî da ku êrîşên artêşa Tirk a dagîrker ên ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê dewam bikin û got; “Ev êrîş xebata rêveberiyê ya li dijî Koronavîrûsê asteng dikin.” ***R-4***

## 5 hezar pakêtên alîkariyê li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatin belavkirin



Meclisa Giştî ya taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê 5 hezar pakêtên alîkariyê ji dermanên cilan li malbatên her du taxan belav kirin. Piranî alîkarî li malbatên ku xebata wan ji ber qedexeya çûnhatinê hatiye sekinandin, hatin belavkirin. ***R-6***

## 46 hunermendên Kurd stirana ‘Zindana Diyarbekirê Emê Bişkînin’ xwandin



Ji bo piştgiriya girtiyên Kurd ên li Zindana Amedê, 46 stiranbêj û hunermendên Bakur û Rojavayê Kurdistanê stirana “Zindana Diyarbekirê Emê Bişkînin” bi hev re xwandine û vîdeoklîba vê belav kirine. Hunermendên Kurd bi riya vê berhema mûzîkê daxwaziya berdana girtiyên siyasî yên Kurd kirin. ***R-7***

# Meclisa Kantona Qamişlo alîkariya malbatên xizan dike

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo alîkariya welatiyan di gel rewşa qedexeya derketina derve, dayîna fatoreyên av, kehrebe û paqijiyê heta 2 mehan (Gulan û Hezîran) betal kirin û biryara belavkirina madeyên xwarinê li welatiyan da.



Piştî biryara Rêveberiya Xweser, meclisên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi qeydkirina navên malbatên xizan kirin. Meclisa Kantona Qamişlo bi riya komînan navên malbatên xizan qeyd dike. Hevserokê Meclisa Kantona Qamişlo Hozan Mejdo li ser mijarê wiha got: "Kampa Newroz hezar pakêtên alîkariyê dabûn me, da ku em li malbatên xizan belav bikin." Hozan diyar kir ku ew navên lîsteyan bi riya komînan qeyd dikin û dagirtin û wiha dewam kir: "Lîste li ser sê beşan tên amadekirin (destkurt, xizan, navî). Destkurt malên ku kesê debara wan nînin, xizan malbatên karker ku rojane debara xwe dikin, navî jî malbatên xwedî dikan ku niha dikanên xwe girtine û kar nakin."

Hozan li ser sîstema belavkirina alîkariyan jî wiha got: "Wê ji bo her komînê, erebeyek bê dayîn û wê alîkariyê li ser malbatên ku navên wan hatine qeydkirin, belav bikin."

## Kampa Newroz hezar pakêtên xwerek ji bo hewcedaran şandin




Rêveberiya Kampa Newroz a Dêrikê hezar pakêtên xwerek ji depoyên xwe şandin Qamişlo da li hewcedaran werin belavkirin.

Têkildarî şandina hezar pakêtên xwerek, endama rêveber a Kampa Newrozê Dîcle Mihemed wiha got: "Wê ev pakêt li hewcedaran bên belavkirin. Ev însiyatîfa Desteya Kar û Barê Civakî û Xebatê ye."

Dîcle Mihemed axaftina xwe wiha domand: "Ev pakêt ên Desteya Kar û Barê Civakî û Xebatê ne û li kampê de hatibûn depokirin. Ji ber rewşa herêmê û rewşa qedexeya derketina derve ji ber Koronavîrûsê, wê li welatiyan bên belavkirin."

## Kesekî ji Kobanê ji ber Koronavîrûsê li Almanyayê jiyana xwe ji dest da



Kesekî ji bajarê Kobanê ji ber vîrûsa koronayê ya nû (Covid-19) li bajarê Bremen ê Almanyayê jiyana xwe ji dest da.

Xalid Mihî El-Dîn Hemo (55) piştî ku bi vîrûsa koronayê ketibû û 10 rojan di nexweşxaneyê de mabû, roja Çarşemê jiyana xwe ji dest da. Hemo ji gundê Zerkotik ê rojavayê Kobanê ye û bavê 6 zarokan e. Berî 3 salan çûbû Almanyayê.

Hat zanîn ku Xalid Mihî di veguhestina pereyan de dixebitî û tevî malbata xwe di karantînayê de bû. Lê belê cîranekî Hemo serdana mala wan dikirin û bi rêya wan ew jî bi Koronavîrûsê ket.

Ev cara yekemîn e ku kesekî ji Kobanê ji ber Koronavîrûsê jiyana xwe ji dest dide.

Heta niha li bajarê Kobanê û gundên wê û li seranserê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ti kes bi Koronavîrûsê neketiye û ti agahiyên derbarê nexweşên din ên ji herêmê ku li derveyî welêt dijîn jî nînin.

## Li girtîgehên Îranê protesto: Herî kêm 35 girtî hatin kuştin



Li gorî Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî ji ber pandemiya Covîd-19'ê gelek girtiyan ji bo daxwaziyên rewa çalakiyên prostestoyê li dar xistin û herî kêm 35 girtî hatine kuştin.

Li gorî Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî herî kêm li 8 girtîgehan, girtiyan ji ber fikara bi koronavîrûsê bikevin çalakiyên protestoyê li dar xistine.

Rêxistina Efûyê diyar kir ku gardiyan û hêzên ewlekariyê bi fîşek û bombeyên gazê êrîşî girtiyan kirine, herî kêm 35 girtî hatine kuştin û 100 girtî jî birîndar bûne.

Li gorî Rêxistina Efûyê, medyaya mûxalif û gelek rêxistinên mafên mirovan koronavîrûs ketiye nava girtîgehên Îranê jî. Sazî diyar dikin ku gelek girtî li hemberî şertên girtîgehê û rîska belavbûna nexweşiyê ketine grevê.

29'ê Adarê berdevkê Wezareta Edaletê ya Îranê Gulamhuseyî Îsmaîlî diyar kiribû ku ji 19'ê Adarê heta 3'yê Nîsanê 100 hezar girtiyan sûd ji destûra derketina derve girtiye. Ji bo girtiyan ev destûr heta 19'ê Nîsanê hatiye dirêjkirin.

Li Îranê li gorî jimarên fermî 4 hezar kes ji ber koronavîrûsê mirine. Lê li gorî çavkaniyên muxalif li 242 bajaran 22 hezar kes mirine.

## Li Amedê li dijî artêşa Tirk çalakiyên gerîla



Li navçeya Hênê ya Amedê gerîlayên HPG û YJA Starê li dijî artêşa Tirk çalakiyek li dar xistin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiyên gerîla yên li navçeya Hênê ya Amedê daxuyaniyeke niviskî weşand.

Daxuyanî wiha ye:

"28'ê Adarê hêzên me li navçeya Hênê ya Amedê li dijî qereqola Hêgasorê çalakiyek kirin. Di vê çalakiyê de derbên giran li çeper û stargehên qereqolê xistin. Jimara leşkerên mirî û birîndar diyar nebûye.

5'ê Nîsanê hêzên me li navçeya Hênê li dijî stasyona bazê ya li qada Horselê çalakiyeke sabotajê kirin. Piştî vê çalakiyê ku stasyona bazê hat roxandin, artêşa TC'ê ya dagîrker 7'ê Nîsanê li qadê operasyonek da destpêkirin. Ev operasyon 8'ê Nîsanê bê ku encamê bistîne, vekişiyaye.

Yekîneya me ya çalakî kirî, bi selamatî gihîştiye cihê xwe."

## Mala Çavdêriyê: Çeteyên DAIŞ'ê êrîşî hêzên Şamê kirin

Mala Çavdêriyê ya Mafê Mirovan a Sûriyê diyar kir ku li herêma Humusê çeteyên DAIŞ'ê êrîşî rejîma Sûriyê kirine û ji her du alîyan gelek kes mirine.

Mala Çavdêriyê diyar kir ku li rojhilatê Humusê hê jî çeteyên DAIŞ'ê hene û li Çola El Suknayê êrîşî çeperên rejîma Sûriyeyê kirine.

Mala Çavdêriyê diyar kir ku, di şer de balefirên şer ên Rûsyayê jî hem eniya şer, hem li cihên din ên çolê dane û ji enîya Şamê 18 kes mirine. Mala Çavdêriyê diyar kir ku 11 çete jî mirine.



## Koalisyona Erebî li Yemenê agirbest ragihand

Koalisyona Erebî ya ku Erebistana Siûdî li Yemenê serkêşiya wê dike, ragihand ku roja Pêncşemê agirbestê dest pê kiriye û wê 2 hefteyan dewam bike.

Berdevkê koalisyonê Eqîd Tirkî El-Malikî diyar kir ku koalisyonê roja Pêncşemê li Yemenê agirbest ragihand û wê 2 hefteyan dewam bike. Agirbest li gorî saeta herêmê saet 12:00'an dest pê kir. Herwiha da ku rewşên guncaw ji bo vexwendina nûnerê taybet ê sekreterê giştî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) ji Yemenê re baş derbas bibe, dibe dema agirbestê dirêjtir jî bibe.

Nûnerê taybet ê sekreterê giştî yê NY`yê Martin Griffiths ji bo lidarxistina civîna di navbera hikumetê û Hûsiyan û tîma leşkerî ya koalîsyonê de wê biçe Yemenê. Di civînê de jî wê behsa pêşniyarên têkildarî mekanîzmaya pêkanîna agirbesta domdar a li Yemenê, pîvanên avakirina baweriya mirovane û aborî, herwiha di navbera aliyên Yemenê de dest bi proseyên siyasî bikin.

## Pentagon: 2 hezar leşkerên Emerîkayê bi Koronayê ketine




Li gorî Associated Press, Pentagon ragihand ku jimar herî zêde ya leşkerên bi "Covid-19) ketîn di hêzên deryayî de ye ku 500 kes hatin tesbîtkirin.

Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê bi jimara kesên bi vîrûsê ketîn di radeya yekê de e, zêdeyî 400 hezar kes bi vîrûsê ketine û zêdeyî 12 hezarî jî mirine.

Li seranserê cîhanê milyonek û 400 hezar kes bi vîrûsa Koronayê ketine, herwiha jimara kesên mirî ji 83 hezarî derbas bûye. Jimara kesên baş bûyîn ji 302 hezarî derbas bûye.



# Albûma nû ya Awazên Çiya: Botan

Koma mûzîkê ya gerîla Awazên Çiya ku bi stiran û klîbên xwe balê dikişîne, bi albûmeke nû derdikeve pêşberî guhdarên xwe. Awazên Çiya albûma ji sala 2017'an ve li ser dixebite temam kir.

Stranên di albûmê de ji nava klasîkên Botanê hatine neqandin. Albûm ji 10 berheman pêk tê û aranjeya wê jî Mehmûd Berazî kiriye.

Albûma nû ya Awazên Çiya ya bi navê Botan, 8'ê Nîsanê ji aliyê Enstîtûya Çandê ya Kurd-Elman û kanala nû ya mûzîkê ya dîjîtal ve li platformên dîjîtal hemûyan hat weşandin.

Komê ev berhema xwe di şexsê Mehmet Tunç, Pakîze Nayir û Asya Yuksel de diyarî şehîdên berxwedana xwerêveberiyê ya Cizîrê-Botanê kir.

Têkildarî çîroka albûma Botanê û pêvajoya hilberînê, Koma Awazên Çiya ev agahî da:

"Projeya albûma Botanê wek pêşniyar û fikrekî derket holê. Ev fikir jî bi lêkolîna li ser kevneşopiya mûzîka gel a Botanê dest pê kir. Di çarçoveya pêvajoya lêkolînê de ku me sala 2017'an dest pê kir, destpêkê me di nava komê de wezîfe par ve kir û me klasîkên Botanê yên nivîskî û qeydkirî berhev kirin. Komê li ser her stiranê nîqaş kir. Li aliyekî me çîroka her stranê lêkolîn û şîrove kir, li aliyê din jî yên me ji nava wan neqandîn li studyoyê qeyd dikir. Piştî qeydan Mehmûd Berazî bi kedeke mezin aranjeya stranan kir."

Koma Awazê Çiya got; "Ev albûm jî jinûve vegotina kevneşopiya berxwedanê ye. Berxwedan û serketin bi dilsoziya bi cewherê vê kevneşopiyê û nûkirina wê dibe. Em jî bi wî rengî nêzîk bûn." Hûn dikarin li ser van lînkan guhdarî bikin.



https://www.youtube.com/channel/UCXZYTJNryN1yh-xCmLv2D8w

https://www.youtube.com/user/PelRecords

## Ma Mûzîkê bi riya telekonferansê dest bi dayîna dersan kir



Mamosteya Ma Mûzîkê Evîn Tîryakî diyar kir ku dersên bi riya telekonferansê dane destpêkirin. Hem wê şagirtên wan pêş bixe, hem wê malbatan ji travmaya ji ber vîrûsê rizgar bike.

Ji ber koronayê ku bandora xwe li seranserê cîhanê dike, ji bo xweparastinê her kes ket nava liv û tevgerê û tedbîran digirin. Di çarçoveya tedbîrên hatîn girtin de perwerdeya li dibistan hat betalkirin û gelek saziyan jî navber da xebat xwe. Koma Ma Mûzîkê jî ji bo ku ewleyiya xwe bigire berî demeke kurt navber dabû xebata xwe. Koma ku navber da xebata xwe ji bo ku xebata xwe bi awayekî din bidomîe ket nava hewldanan û niha bi riya telekonferansê xebata xwe dide domandin. Mamosteya zarokên Koma Ma Mûzîkê Evîn Tiryakî li ser xebata komê ya nû ku dane destpêkirin axivî.

Evîn Tiryakî di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku xebata xwe bi pergala onlîne ji malan bi vîdyodersan didin meşwandin û wiha axivî: "Em her sal meha Adarê ango hefteya Newrozê bi qasî 2 hefteyan betlaneyê didin şagirt û mamosteyên xwe. Lê îsal mixabin ji ber vîrûsa koronayê me hefteyekê zûtir navber da dersen xwe û em vekişiyan malê. Navbera me 4'ê Nîsanê qediya û me careke din dest bi dersan kir. Lê vê carê li gorî 3 hefteyan berî niha cudahiyeke heye. Ji ber ku êdî ne em û ne jî şagirtên me em nikarin ji malên xwe derkevin me bi pergala onînê bi videodersan dest bi xebatên xwe kir

## Hunermendên Rojava klîbek bi zimanên Kurdî û Erebî belav kirin

Hunermendên Rojavayê Kurdistanê, klîba xwe ya herî nû bi navê Revanê Resen li tora civakî ya YouTube belav kirin, ku bi zimanê kurdî û erebî tê de xwandine.

Hunermendên Kurd û Ereb bi hev re klîbeke balkêş amade û belav kirine, tê de bi zimanê li herêma Rojavayê Kurdistanê distirînin, vê carê Mêrînî jî tê de heye.

Di klîbê de, hunermendên Kurd û Ereb ên ji herêmê beşdar bûne.

Berhema nû ji aliyê hunermend Bêkes Darî ve hatiye amadekirin û Kawe Xalîd dabeşkirina mûzîkê jê re kiriye û 22 hunermendên Kurd û Ereb bi hev re distirînin.

Vîdyoklîb ji aliyê Hunergeha welat ve hatiye amadekirin û Delîl Mîrsaz derhêneriya wê kiriye, herwiha Ronî Elî karê montajê û Elî Koçer û Roder Hebîb karê kişandina dîmenê klîbê kirine.

Di klîbê de stranên folklorî yên wek Zembîlfiroş û Hoy Hoy Memo û Hoy Hoy Esmer hatine xwandin, ku xelkê Kurdistanê ji her çar parçeyên Kurdistanê gelek bîrewerî li gel wan stranan hene.

Rojavayê Kurdistanê mozaîkek e, Kurd, Ereb, Ermenî, Suryanî, Misilman, Êzîdî, Mesîhî û gelek civakên din bi hev re di nava aştiyê de dijîn.





## Kurdan Dermanê Covid-19 Dît!

Sîpan ŞÎNDA

Ez her tim dibêjim, aqilê Kurdan di çavê wan de ye. Lê îcar niha ji çavên wan jî derket û çû ket "xewnên" wan. Ji heyva Berfanbarê ve nexweşiya li Çînê derketî û belavî gerdûnê bûyî, îro cîhan hemû xistiye nava taya mirinê. Dinya hemû rabûye ser hilûpepana û lê digerin ku ka çareyekê ji vê nexweşiya vegir re nabînin. Her çenda zanist, tib, teknolojî ango mirovayî gelek pêş de çûye jî, lê belê mirovayî îro ketiye xetereke mezin. Sazî û dezgehên lêkolînên zanistî, tibbî, biyolojîk, kîmyevî dikin, îro karên xwe yên din dane aliyekî, şev û rojên xwe dikin yek û ketine nava lêkolînan. Hewl didin ka berî gavekê dermanekê ji vê nexweşiya hinde dijwar re nabînin. Vê nexweşiyê aborî û bazirganiya cîhanê serûbin kiriye. Feqîr û jar di malên wan de êxsîr kirine û nikarin biçin nanekî ji erz û eyalê xwe re bînin. Her çenda ji aliyê cîhanê û mirovayiyê ve rewş evqas jidil e çareserî hê nehatiye peydakirin. Lê ji aliyê Kurdan ve rewş hatiye çareskirin û dermanê vê nexweşiya hinde gerdûn êxsîr kirî, bi "xewnekê" peyda kirin. Jinikekê got min xewnek dîtiye û melayekî zir cahil jî derket xewna jinikê kir video û bi riya teknolojiyê di nava gel de belav kir. Mela di video ya xwe de dibêje "jineke nimêjker pêxember di xewna xwe de dîtiye û gotiye bila umeta min ava simaqê vexwe, wê wan ji vê nexweşiya Covîd-19 biparêze." Piştî belavkirina vê vîdeoyê êdî Kurdan malên xwe tejî simaq kirin û kêlo ya simaqê ji sê-çar qatî zêde bû. Raste, ez ji dizanim faydeya simaqê heye. Ji bû birîn kewandinê (xwîn sekinandin) gelekî baş e. Ango antîoksîdan e. Hekîmên Kurmancî ew ji bû tayê û heraretê ji bi kar anîne. Herwiha li hemberî edabgirtina birînan jî bi kar anîne. Lê ev nexweşiya niha derketî, tişteke gelek cuda ye. Nexweşiyeke pirr cidî ye. Ji ber wê Saziya Tenduristiyê ya Cîhanê rewşa "pandemî" îlan kir. Ango got ev nexweşiyeke vegir e û dikare qira mirovan bîne. Ew melayê "zana" û aqilê xwe ji "xewnan" digire, rabû derket bi xewnekê derman dît! Serde jî dibêje, 'pêxember gotiye ne misilman tenê, herwiha vî dermanî nîşanî xeyrî misilmanan ji bikin.' Te mirovayî ji belayeke mezin xelas kir mela! Divê xelata Nobel'ê ya 2020'an bidin te! Ez çi bêjim, Xwedê aqilekê bide te mela! Ev çi dide nîşanî mirovan, tê xuyakirin ku hê cahil û nezan di nava me de zehf in. Asta têgihîştina me ya civakî, neteweyî û zanistî hê gelek kêm e. Her çenda her tişt li ber çavên me ye jî, em hê baweriya xwe ji zanistê pitir li xewnekê tînin. Heta mirov dikare bibêje ev kesên wiha vî karî bi awayekî sîstematîk û zanebûn dikin. Gelo heke hina ji ber vê gotinê tedbîrên xwe negirtin û ji ber vê nexweşiyê mirin, hingê wê çi bibe? Hingê qetlê wan kesan nakeve stûyê vî melayê li gorî xewnan rêberiya civakê dike? Pêşiyan gotiye "aqilê kurî ker li ser birî". Ez jî dibêjim, aqilê melê wê me bibe gorê!

# Bi însiyatîfên şexsî alîkariya malbatên xizan dikin

Di çarçoveya qedexekirina çûnhatinê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, rastiya hevgirtina civakî di nava beşên civakê de derket pêş. Herwiha însiyatîfên mirovî yên alîkariya kesên pêwîstiya wan bi alîkariyê heyî, zêde bûn.



Ji ber belavbûna Koronavîrûsê gelek welatên cîhanê û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê biryara qedexekirina çûnhatinê derxistin. Piştre jî ji bilî yên sebze û pêdiviyên jiyanê yên sereke û dermanxaneyan, dikan tev hatin girtin. Bi vê re xebata gelek kesên ku rojane dixebitîn û debara malbata xwe pê dikirin, hat sekinandin. Ji ber wê jî rêxistinên mirovî yên herêmî û gelek kesan dest bi însiyatîfa komkirina alîkariyan û belavkirina wan kir. Rêveberiya Xweser jî biryarnameyek derxist ku li herêmên Rêveberiya Xweser û her heft rêveberiyên sivîl li Bakur û Rojhilatê Sûriyê alîkarî li malbatên xizan werin belavkirin. Li kantona Şehbayê welatiyê bi navê Ehmed Umer yê ji koçberên Efrînê, dest bi însiyatîfeke şexsî kir. Wê pereyan ji 25 dost û nasên xwe kom bike da li malbatên xizan belav bike. Ehmed Umer bang kir ku ji ber loziya Koronavîrûsê li derdora malbatên xizan kom bibin.

## ‘Heta bidawîbûna qedexeyê wê dezenfektekirina bajaran bidome’



Bi belavbûna Koronavîrûsê li cîhanê re Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek tedbîr yên amadekirina karantînayan, girtina deriyên sînor û dezenfektekirina tevayiya bajaran girtin. Kolanên bajar û bajarokên herêma Firatê li gel biryara qedexeya derketina derve ya ku Rêveberiya Xweser a Bakurû Rojhilatê Sûriyê ragihandiye, di gelek qonaxan de tên şûştin û dezenfektekirin.

Girêdayî mijarê hevserokê Rêveberiya Giştî ya Derdorê ya herêma Firatê Semîr Ferdon Elî ji ANHA`yê re cureya dezenfektekirinê ya ku tê bikaranîn, qonaxên wê û asta bandora wê şîrove kirin.

Elî wiha got: “Prosesa dezenfektekirinê li ser sê qonaxan tê meşandin. Ya yekê 15`ê Adarê bû tevayiya navend û gerînendeyên herêmê bi du cureyên dezenfektan ‘Formline and sidex’ hatin dezenfektekirin. Pişt re me mizgeft û dibistan li ser asta herêma Firatê bi heman madeyan dezenfekte kirin.”

Elî diyar kir ku di qonaxa sisiyan de kolan li tevayiya bajar û bajarokên herêmê hatin şûştin û bi madeya klorê hatin dezenfektekirin. Bi vê re zemîn amade bû ku Formline bê bikaranîn.

## Şaneya Aloziyê ya Efrînê rêzebiryar dan

Ji bo rewşa awarte ya ji ber vîrûsa Korona Şaneya Aloziyê ya herêma Efrînê civînek li dar xisti û têkildarî rewşê çend biryar girtin.

Têkildarî van biryaran hevseroka Kantona Efrînê û endama Şaneya Aloziyê Şirîn Hesen wiha got: “ Me gelek biryar dan. Yek ji wan avakirina karantînayan ji kesên ku ji derveyî kantonê tên. Ew heta 14 rojan di karantînayan de dimînin. Li gorî biryara duduyan, xwediyên patozan dikarin patozên xwe amade bikin. Wê dikanên guhertina parçeyên patozan werin vekirin. Li gorî biryara sisiya dikanên madeyên xwarinê, sebze û goştfroşan, tevî vekirina dermanxaneyan ji saet 08:00`an heta 18:00`an tên vekirin. Qedexeya derketina derve ji saet 18:00`an destpê dike. “

Li gorî Şirîn biryara çaran ku şaneyê daye, wê mazot di dema



tinebûna mazotê û qedexeya derketina derve de li welatiyan li gorî kartên diyar were belavkirin.

## Projeya kanalîzasyona ava şapeyê heta 3 mehan bi dawî dibe

Şaredariya Gel a Kobanê qonaxa sisiya ya projeya kanalîzasyona ava şapeyê ya Taxa Şehîd Serhed didomîne. Şaredarî wê xebatê heta 3 mehan bibe serî.

Digel belavbûna Koronavîrûsê (Covid-19) li welatên cîhanê û qedexeya derketina derve, li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî Şaredariya Gel a Kobanê projeyên xwe yên stratejîk li gel girtina tedbîrên tenduristî yên pêwîst, temam dike.

Şaredariyê li ser daxwaziya welatiyan û bi armanca sivikkirina pirsgirêkên taxên bajêr yên ji ber şapeyê ji meha Sibatê ve dest bi projeya kanalîzasyona ava şepeyê kiriye.

Ev, projeya hatî mezin ya li Kobanê ye. Di qonaxa yeke û duduyan de ku dawiya havîna borî pêk hatibûn, tore bi dirêjayiya 6 km hat dirêjkirin. Niha xebat di qonaxa sisiyan de bi dirêjayiya 3 km tê meşandin.

Berpirsê projeyê Nayif Cemal Xelî got; “Proje bi xwe rogareke girtî ye. Em hinek zehmetiyan dikişînin, lewre di hin cihan de ji ber zêdebûna toreyên avê û kanalîzayonê ax hildiweşe.

## 5 hezar pakêtên alîkariyê li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatin belavkirin

Meclisa Giştî ya taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê 5 hezar pakêtên alîkariyê ji dermanên cilan li malbatên her du taxan belav kirin.

Piranî alîkarî li malbatên ku xebata wan ji ber qedexeya çûnhatinê hatiye sekinandin, hatin belavkirin.

Di nava alîkariyan de sabûn, lodelîn, klor û dermanê cilşûştinê hene. Alîkarî li komînan tên belavkirin û ew jî li malbatan belav dikin. Li Taxa Eşrefiyê 250 pakêt û li Taxa Şêxmeqsûdê jî 4 hezar û 750 pakêt hatin belavkirin.

Girêdayî mijarê hevseroka Meclisa Giştî ya Taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê



Valentîna Ebdo wiha got: “Ji ber belavbûna Koronavîrûsê li cîhanê em tedbîrên pêwîst digirin da welatiyan ji vîrûsê biparêzin.”

Valentîna spasiya şêniyên her du taxan kir ku li gorî biryara qedexeyê tev digerin, herwiha spasiya sazî, Hêzên Ewlekariya Hundir û HPC`ê kir ku xizmeta welatiyan dikin da wan ji vîrûsê biparêzin.

## Li Şedadê xebata Şaredariya Gel û Komîteya Zimhêrê

Şaredariya Gel û Komîteya Zimhêr ên navçeya Şedadê li gel qedexeya derketina derve xebata xwe bênavber didomînin.

23`yê Adarê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêşîgirtina li vîrûsa Korona li herêmê qedexeya derketina derve ragihand. Di biryara qedexeya derketina derve de dikanên madeyên xwarinê û dermanxane di nava xwe de nagirin. Li aliye din komîteyên Şaredariya Gel xebata paqijiyê, dezenfektekirin û çavdêriya dikanan didomînin da rê li pêşiya keysbaziyê bigirin.

**40 DIKAN HATIN CEZAKIRIN**

Li navçeya Şedadê ya girêdayî kantona Hesekê, Komîteya Zimhêrê dikanên ku madeyên bingehî biha difroşin, zeft kirin.



Endamê rêveber ê Komîteya Zimhêrê ya Şedadê Xalid El-Hecî diyar kir ku firoşkarên li dikanan belav dikin, keysbaziyê dikin, madeyên bingehî yên mîna şekir, çay ,zeyt û madeyên din biha difroşin. El-Hecî diyar kir ku zêdetirî 40 bazirgan û xwediyên dikanan hatin cezakirin.



# Rewşa tenduristî ya girtiyên jin ên li Girtîgeha Tirkiyê giran e

Di hevdîtina bi telefonê ya girtiya bi navê Merve Aydogan a li Girtîgeha Jinan a Bunyan a Kayserî ya li gel malbatê diyar kir ku sê hevalên wê yên jin pirsgirêkên wan hene, bêhntengî û ziwabûna qirkê li wan peyda bûne.



Girtiya nexweş Merve Aydogan a li Girtîgeha Jinan a Bunyan a Kayseriyê tê girtin, rewş, şert û mercên li girtîgehê bi rêya telefonê ji malbata xwe re vegot. Aydogan ev agahî dan malbata xwe: “Roja Înê mîda min li hev ket, çavên min baş êdî nedidîtin. Hê jî baş nabînim. Tojda Tokû a li gel me piştî 4 rojan heman tişt bi serê wê jî hat. Ew jî gêj dibe, çavê wê baş nabîne. Nikarim baş li ser lingan xwe bigirim. Heman tişt bi serê Pinar Demîr jî hat. Bi Nazli Soglî re jî şewitîna qirikê û koxika wê ya hişk heye. Li gel min jî ‘şewitîna qirikê, bêhntengî û pirsgirêka baş nedîtinê heye.’ Doktorê girtîgehê hat, lê pirsgirêkên me vegotîn ji wan fim nekir. Hinek tîp nişan dan lê min nikarî bixwînim. Doktor ji bo min got; tu kor bûyî. Derman da lê ti faydeya wê nîne. Ji ber pirsgirêkên tenduristiyê, em neçûn nexweşxaneyeke derve û ji derve jî ti doktor nehatine. Lê ev destpêkek e.”

## HDP’ê qebûlnekirina serlêdana jinan a stargehê ji meclisa Tirk pirsî



Parlamentera HDP’ê ya Amedê Remziye Tosun, qebûlnekirina serlêdana jinan a stargeha jinan bir rojeva meclisa Tirkiyê.

Parlamentera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ya Amedê Remziye Tosun, ji ber Stargeha Jinan a girêdayî şaredariyên Amedê, serlêdanên jinan qebûl nake, pirsname da meclisa Tirkiyê û xwest mijar bê lêkolînkirin û çareserkirin. Tosun, diyar kir ku di vê pêvajoya vîrûsa Korona de ku li Tirkiyê belav bûye ji 11’ê Adarê heta 31’ê Adarê 21 jin hatine kuştin û wiha got: “Ji jinên hatîn kuştin 18 ji wan di malê de hatine kuştin. 9 jin jê zewicîbûn. 5 jin jî ji aliyê birayên xwe ve hatine kuştin. Di vê pêvajoya şideta li ser jinê zêde dibe de, Mala Jinan a Kardelen a Şaredariya Rezan û Navenda Sepantin û Lêkolîna Pirsgirêkên Jinan (DÎKASUM) a Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê serlêdana jinan red dike.

Tosun, ji bo ku Wezîrê Karê Hundir yê Tirk Sulayman Soylu bersivê bide ev pirs kirin:

“* Redkirina serlêdana jinan weke wezîr agahiya we jê heye?

* Şaredariyên ku serlêdana jinan red dikin ferman û talîmatan ji kû digirin?

* Sedema redkirina serlêdana jinan a Stargehan çi ye?

* Jinên ku mafê wan tê binpêkirin û serî li van stargehan didin, piştî redkirina serlêdanê ji bo van jinan ti tedbîr tên gritin?

* Derbarê şaredariyên ku serlêdan red kirine de ti lêpirsîn hatine destpêkirin ya na? Ku nehatibe destpêkirin wê lêpirsîn bê vekirin?”

## YJA Starê li Heftenînê çalakî kir



Gerîlayên YJA Starê li herêma Heftenînê li dijî yekîneyên artêşa Tirk a dagîrker çalakiyek li dar xist.

Navenda Ragihandin û Çapemeniye ya HPG’ê daxuyaniyek weşand û ev agahî dan: “Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî de ku li herêma Heftenînê ya Herêmên Parastinê yên Medyayê didome, hêzên me yên YJA Starê 6’ê Nîsanê saet 13:00 li dijî artêşa TC a dagîrker a li ser Girê Konferansê çalakiyek kirin. Derbên giran li stargeh û çeperên dijmin hatin xistin. Jimara leşkerên di vê çalakiyê de mirîn û birîndar bûyîn nehat zanîn.”

## Jinên YPJ şirîkên azadiyê ne

**Hediya Hisên\Ronahî Qamişlo**

Li seranserê dinyayê jinên YPJ´yî bûne mînaka hêz û azadiyê, bandor li jinên cîhanê kirine û ji wan re nîşan dane ka jin dikarin çiqas şer bikin û xwe biparêzin.

Derbarê mijarê de Hevseroka YPJ´ê Nesrîn Ebdelah ji rojnameya me re wiha axivî: “Salvegera heştan ya avakirina YPJ´ê di serî de şehîdên me, em li kesên soz dayîn bibin qehremanên vê doze û di riya wê de canê xwe feda kirîn û li jinên cîhanê hemûyan pîroz dikin.”

Nesrîn Ebdelah di dewam axaftina xwe de wiha got: “YPJ bi keda xwe ji sînorên erdinîgarî, olî, çandî û neteweyî derbas bû. Nasnameyeke jinê ya xweser û hevgirtî derxist. YPJ´ê hem nûnerî kir, hem guhertineke çandê ya navneteweyî afirand. Ji her gelî di nave de cihê xwe girtin. YPJ bû nasnameya her



jina li cîhanê, jinan jî bi vî rengî xwe da naskirin.”

Nesrîn Ebdelah bal kişand ser artêşa jinê û wêha axivî: “Ev 8 sal in YPJ ji bo hebûna xwe têdikoşe. Divê em bikarin ji gelê xwe artêşekê bidin avakirin. Rast e avakirina artêşeke jin zehmet e, lê bi xebata YPJ´ê û keda wê her tişt wê serkeftî be.”

Nisrîn Ebdelah bîr xist ku YPJ´ê di qadên xwe de guhertin çêkir û bi bondora li jinên cîhanê bû nasnameyeke bêsînor.

Hevseroka YPJ´ê Nesrîn Ebdelah axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Di dema dagîrkirinê de gelekjin tevlî YPJê bûn û bi sedan şervanên me şehîd bûn. Her dem soza me ewe ku em Efrîn Serê Kaniyê û Girê Sipî rizgar bikin.

## ‘Ez pir kêfxweş im ku îro bi dirûtina rûpoşan xizmeta civakê dikim’

Jina bi navê Felek Silêman a ji gundê Maşoqyê, odeya xwe ya cilûbergan tê de didûrê kiriye cihê çêkirina rûpoşên parastina ji Vîrûsa Koronayê. Felekê wiha got: “Ez pir kêfxweş im ku ez vê xizmetê ji bo mirovên civaka xwe pêşkêş dikim. Di van rewşên wiha de, divê em li hev miqate bin. Ez bawer im ku piştî vê nexweşiyê wê bihara gundê me bi tevgera jinan û lîstokên zarokên me zindî bibe.”

Di her qada jiyanê de pêşengiya jinê derdikeve pêş, bi ruhekî germ û vîneke bihêz beşdarî her qada jiyanê dibe. Jin ji bo parastina civakê hemû derfet û keda xwe dike xizmetê, ji bo avakirina civakeke aram û rast bê navber tev digere. Jina bi navê Felek Silêman (45) di odeyeke piçûk a mala xwe de dirûtina cilûbergên jinan dikir. Piştî belavbûna Vîrûsa Koronayê, Felek xwest keda xwe ji bo civaka xwe bike û karê dirûtina cilûbergan veguhert dirûtina rûpoşên parastina ji vîrûsê.

# ‘Bi piştgiriya civakî em dikarin ji vê pêvajoya zehmet derkevin’

Endama Desteya Rêveber a PYD’ê Foza Yûsif diyar kir ku Rêveberiya Xweser bi saziyên xwe yên tenduristiyê û kedkarên xwe yên tenduristiyê li gorî derfetên xwe seferber bûye û berpirsyariya xwe bi civakê re par ve dike.

Endama Desteya Rêveber a PYD’ê Foza Yûsif ji ANF’ê re axivî.
Foza Yûsif bîr xist, ku şer û êrîş rîska belavbûna nexweşiyê zêde dike, pêşî li tedbîran digire. Ji ber wê Neteweyên Yekbûyî bang li her kesî kir, lê belê dewleta Tirk guh nade vê bangê. Gihîştiye wê radeyê ku bombeyan li stasyonên avê bibarîne, avê qut bike. Bi şer û siyaseteke bêexlaq dixwaze vîrûs li vê derê jî belav bibe û rê li ber felaketekê veke. Heta niha çete bi kar dianîn, niha jî dixwaze vîrûsê bi kar bîne.”
Foza Yûsif diyar kir ku helwesta hêzên rejîma Sûriyê ya li dijî êrîşan gelekî qels û got, “Bi taybetî di êrîşa dawî de ya li Til Temirê hat dîtin. Dewleta Tirk careke din qanûnên navneteweyî û serweriya Sûriyê binpê dike. Helwesta ku li dijî vê tê nîşandan lawaz e.”
Têkildarî tedbîrên wan ên li dijî vîrûsa koronayê jî Foza Yûsif wiha got: “Rêveberiya Xweser heta niha biryarên di cih de girtin û kedeke mezin nîşan dide. Eger li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê hê nexweşekî bi vîrûsê tinebe ev ne tiştekî tesadûf e. Sazî û kedkarên tenduristiyê, şaredarî û kedkarên wê, Asayîş, ango Rêveberiya Xweser sazî û derfetên xwe hemû seferber kirine. Bêguman hin rastî jî hene. Li seranserê Sûriyeyê navendên tenduristiyê, plansaziya tenduristiyê hemû bûne qurbanên tenduristiyê. Alîkariye hikumeta navendî ji bo vê derê nîne. Sazî û rêxisitnên navneteweyî jî ku şaxên wan li vê derê hene piştgiriyê nadin. Di rewşeke



wiha de em berpirsyariyê bi civakê re par ve dikin. Em dixwazin her kes xwe berpirsyar bibîne. Eger em bi xemsarî, sist û necidî nêzîk bibin emê rê li ber belvabûna vîrûsê vekin.”
Foza Yûsif bal kişand ser kampanya Heyva Sor û got, “Her mirovê xwedî exlaq, birûmet, hezkiriyê civaka xwe û dixwaze bi tenduristiyeke baş bijî divê tevlî vê kampanyayê bibe. Pêwîst e komîn û meclîsên me baş bixebitin. Li kîjan gundî, li kîjan taxê pêwîstiya kîjan malbatê hebe divê li gel wê malbatê bin. Rizgarî bi civakîbûnê dibe, bi jiyaneke wekhev û piştgiriyê dibe. Bi yekîtî, moral, manewiyat, sebir, fedakarî û berpirsyariyê em dikarin ji nava vê pêvajoya zehmet derkevin.”

## Erzîncan: Civak bi serê xwe dikare xwe ji vê vîrûsê xilas bike



Endama Koordînasyona KJK’ê Besê Erzîncan got; ‘’Dewletan xwest Koronavîrûs belav bibe. Civak bi piştgiriyê dikarin ji vê belayê xilas bibin.’’
Derbarê vîrûsa koronayê de endama Koordînasyona KJK’ê Besê Erzîncan bîr xist ku ji mêj ve nirxandina wê dikirin ku modernîteya kapîatlîst bi sedsala 21’ê re ketiye nava krîzekê, ev krîz ne ji ji bo demeke kurt e, domdar e û krîzên bingehî ne. Erzîncan wiha got: ‘’Pergala hegemonîk a global ketiye zemboqekê û dixitime. Weke ku tê zanîn berî vîrûsa koronayê li her devera cîhanê serhildanên gel, li dijî dewletan û hêzên desthilatan hebûn. Dema mirov li saziyên modernîteya kapîtalîst a van dused salên dawî dinêre, ti caran wekî dema niha nebûbûn saziyên bêbandor, pûç û vala. Weke NYE, YE, parlamentoyên berest, partiyên siyasî û hwd. Em di serdemeke wisa de bûn ku krîzên ekolojîk ji kûr ve bandor li jiyana mirovan dikirin. Niha jî em di vê pêvajoyê de ne.’’
Erzîncan bi domdarî wiha got: ‘’Xuya dike ku ne tesadûf e di pêvajoyeke wiha de nexweşiyên kujer ên weke Koronavîrûsê bikevin rojevê. Hê jî nayê zanîn ka ev vîrûs çawa derketiye holê û çawa derbasî mirovan dibe. Em bala xwe bidinê, her çendî nexweşiyeke kujer e jî, di serî de DYE, Tirkiye û gelek dewletên Ewropayê tedbîrên cidî negirtine.
Dema ku mirov bûyeran tevan analîz bike, mirov dibîne ku pergala hegemonîk bi zanebûn ev vîrûs belav kiriye. Hewl tê dayîn ku bi derxistina nexweşiyên vegirtinê ên kujer bala hêzên demokratîk, azadîxwaz û ekolojîk ên sedsala 21ê û muxaleftê bikişînin û bi dawî bikin. Ji ber wû di rewşa heyî de pêwîst e rengên nû yên têkoşînê yên bi paradîgmaya me ya azadiyê re li hev in û rêveberiyên nû werin geşkirin û berfirehkirin. Ev pêwîstiyek e.

## Bûroya Parastinê: Êrîşên Tirkiyê têkoşîna li dijî vîrûsê asteng dikin



Hevserokê Bûroya Parastinê ya Rêveberiya Xweser Zeydan El-Asî hişyarî da ku êrîşên artêşa Tirk a dagîrker ên ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê dewam bikin û got; “Ev êrîş xebata rêveberiyê ya li dijî Koronavîrûsê asteng dikin.”
Neteweyên Yekbûyî meha borî banga rawestandina bilez a çalakiyên leşkerî kir. Li gorî biryara Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) ya bi jimara 2254, ji ber belavbûna pandemiya Koronavîrûsê (Covid-19) pêwîst e li tevayiya herêman, mîna Sûriyê, Yemen û Lîbyayê şer were rawestandin.

**‘LI SER BANGA GUTERESS ME AGIRBEST RAGIHAND‘**

Li ser banga Sekretêrê Giştî yê NY‘yê Antonio Gutress ya agirbestê, Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) 24‘ê Adarê bi daxuyaniyekê agirbest li tevayiya herêmê ragihand. Lê artêşa Tirk a dagîrker û komên çete yên girêdayî wê êrîşên xwe yên ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomînin, di encamê de gelek kes ji herêmê tên koçberkirin.


**‘DAGÎRKER ÊRÎŞÊN XWE YÊN SER HERÊMÊN ME DIDOMÎNIN‘**

Li ser mijarê hevserokê Bûroya Parastinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Zeydan El-Asî ji ANHA‘yê re axivî.
Zeydan El-Asî diyar kir ku dewleta Tirk sûcên xwe didomîne û got; “Me biryara Neteweyên Yekbûyî ya agirbestê pejirand, lê dewleta Tirk a dagîrker û çeteyên wê êrîşên xwe yên ser herêmên me didomînin.”
El-Asî diyar kir ku dewleta Tirk banga NY‘yê bi cih nayne, rojekê jî sozên xwe pêk neanîne, îro dîsa peymanên xwe yên bi Amerîkayê re yan jî bi Rûsyayê re binpê dike.

## Daxwaziya girtina agahiyan ji Îmraliyê hat redkirin

Parêzerên Rêber Abdullah Ocalan ji bo girtina agahiyan û axaftina bi telefonê serlêdan kirin. Lê serlêdan hat redkirin.
Parêzerên Bûroya Hiqûqa Sedsalê xwestin têkildarî muwekilên xwe Rêber Abdullah Ocalan, Hamîlî Yildirim, Omer Hayrî Konar û Veysî Aktaş tedbîrên pêwîst werin girtin û ji bo pêkanîna van tedbîran agahdarî were kirin, serî li Serdozgeriya Komara Tirk ya Bûrsayê dan. Ev serlêdan hat redkirirn.
Serlêdana ji bo axaftina bi telefonê jî hat redkirin. Ji bo sedema redkirinê jî hat diyarkirin ku ‘Li dijî Abdullah Ocalan, Hamîlî Yildirim, Omer Hayrî Konar û Veysî Aktaş 13’ê Sibata 2020’an heta şeş mehan biryara astengkirinê hatiye dayîn.’

Ronahî



## Korona vîrûsa Kurdan her roj Kurdan dıkuje

Qasım ENGÎN

Malûm e, îro li seranserê cîhanê pandemîna Vîrûsa Korona mirovan dikuje. Vîrûsên bi vî awayî dem bi dem ji bo cîhanê tevê dibin belaya sere mirovayiyê. Lê ev bela ji bo demekê ye. Çendî kapîtalîzm bi mebesta xwe ya kar ango şelandina mirovan xwe fireh dike, ewqas bi nexweşiyên xwe dibe belaya serê mirovayiyê.
Kapîtalîzm ji bo bikare mirovayiyê tevê bişelînê û dest dayne ser keda wan çeka herî pêşketî netewperest; Dewlet-Netewe pêş xistine. ”Netewperestî ola qapîtalîzmê ye.” Bi bêjeyeke din; Netewperestî ureke penceşêrî ye. Her tim asteng dike ku rih, mejî û beden baş bibin. Bi nexweşî dihêle. Kesên di hêla rih û mejî de nexweş be pir zahmete bi kesên din re bi awayekî tendûrist têkiliyê dayne. Çawa ewqas zahmet e kesên wisa li hemberê xwe jî bêbawer û bê tendûrist in.
”Nexweşiya civakbûyîn a bizivire hîsteriyê, bi pergala kapîtalîst a ber bi teşeya faşîst û dewleta totalîter ve hevre diçin. Encam, xwekuştina kapîtalîzmê ye. Şerên cîhanê yên yekemîn û duyemîn di vê wateyê de pergala ku netewperestî bi awayekî pir zêde hatî bikaranîn re ava bûye.” Xwekuştin bêguman tenê bi rêya şeran nebûye, kapîtalîzm pergela ku nexweşiyan bi xwe jî diafirîne. Bajarên bi mîlyonan nîştechih, leystina bi genetika organizma û guherîna wan, çekirina her awayî çekên kuştinê, leystina bi derrdor, kunkirina tebeqeya ozon û her wiha hemû nexweşiyên kapîtalîzm ne ku him me dikujîne him jî xwe bi xwe întîhar dike. Di encam de pergala ku nexweşiyên wek; AÎDS, şewba çûkan, şewba berazan, conagayên din û niha jî Vîrûsa Korona pêşxistiye û di pêşarojê de jî pêş bixe kapîtalîzm dibe.
Her çendî kapîtalîzm her tim pêşxistina nexweşiyên bêyom be jî, lê sîstema bi navê Senteza Îslama Tirk bi xwe nexweşiyeke di dile giştî Rojhilata Navarast de ye. Ya ku pergala bi navê faşîzmê ‘diyariya’ giştî cîhanê kirî ev îdeolojî ye. Fikra ku rê vekir ku Musolînî, -bi taybetî jî Hîtler- û tevahî dîktatorên faşîzan li seranserê cîhanê bibin belaya sere mirovayiyê jî careke din ev îdeolojiya bi navê Senteza Îslama Tirk bi Tirkperestiya xwe ya bi rengê; sor, reş û kesk e.
Heta niha bi nexweşiya Vîrûsa Korona nêzî 60 hezar mirovan canê xwe ji dest dan. Lê Vîrûsa Korona ya Senteza Tirk Îslam tenê di çend heyvan de mîlyonek nîv ermen qirkiribûn. Nêzî 400 hezar Sûryan-Keldan qelandibûn. Dîsa bi sedhezaran Yewnan, Çerkez, Ereb, Cihû, Pontusî û bi mîlyonan Kurd di dîrokên cuda cuda de sotin, koka wan qelandin.
Kurd bi Vîrûsa Korona bi rengê tirkperestiya bi navê Senteza Îslama Tirk li seranserê Kurdistan de mijûl in. Di giştî de dused sal -lê bi taybetî jî van sedsalên dawî de- bê navber tirkperestî wek Vîrûsa Korona erîşa Kurdan dike. Kurdan dikuje, warê wan çol dike, bi demografya wan dileyze, wan koç dike. Ev nexweşiya bêyom bi vê xwe têr nabîne; bi mîrasa wan a dîrokî dileyze, texrîb dike, di jêrzemînan de dişewîtîne, miriyan wan di pişt panzeran de kaş dike, keçên wan tazî dikin û bi onura wan dileyzin, bi gaza kîmyavî disojîne, her roj cihêkî din ya welatê me bomberan û dagir dike.
Bi kurtahî, Korona Vîrûsa tirkparêzî her roj Kurdan dikuje.
Vîrûsa Korona ya cîhanê demkî ye lê ya me Kurdan her roj e, him jî vê sedsala dawî bê navber bi nexweşiya xwe ya tirkperestî me jehrî dikin.
Ka cîhana ku ji bo Vîrûsa Korona tevdigere?



# TEV-DEM li Qamişlo pakêtên xwerek li hewcedaran belav dike

TEV-DEM’ê ji ber qedexeya derketina derve ji ber Koronavîrûsê, pakêtên xwerek li xizanên Qamişlo, Dirbêsiyê û Amûdê belav kirin, wê li xizanên Dêrik, Til koçer, Til Hemîs û Çilaxa jî belav bike.



Endamê Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Ayîd Îbrahîm têkildarî belavkirina pakêtên xwerek got; “Belavkirina pakêtên xwerek bi armanca birêkxistina bajar û komînên taxan e.”
Li ser belavkirina pakêtên xwerek Îbrahîm wiha axivî: “Wê parên xwerek li Qamişlo, Dirbêsiyê, Amûdê û heta Dêrikê werin belavkirin û her parek ji 12 cureyan pêk tê.”
Herwiha Ayîd Îbrahîm sedema nedayîna pereyan ji bilî pakêtên xwerek wiha got: “Ji ber ku qedexeya derve hatiye ragihandin, welatî nikarên pêdiviyên xwe bi dest bixin, em vê alîkariyê dikin.”

## Desteya Kar û Barên Civakî ya Herêma Cizîrê dest bi belavkirina alîkariyan kir



Desteya Kar û Barê Civakî ya Herêma Cizîrê bi daxuyaniyekê belavkirina alîkariyan li herêma Cizîrê ragihand.
Rêveberiya Xweser a Demokratîk ji ber pêşîgirtina li belavbûna Koronavîrûsê (Covid-19) gelek tedbîr girtin û 23`yê Adarê ve qedexeya derketina derve li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ragihand.
Ji ber qedexeya derketina derve gelek zirar gihîşt malbatên karkeran ku niha nikarin bixebitin.
Ji ber wê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 6`ê Nîsanê, bi mebesta alîkariyê bi welatiyan re dayîna fatoreyên av, kehrebe û paqijiyê heta 2 mehan (Gulan û Hezîran ) betal kirin.
Hevseroka Desteya Kar û Barê Civakî ya Kantona Qamişlo Welîda Botî daxuyaniyek da û daxuyanî bi amedebûna hevserokatî û komîteyên Desteya Kar û Barê Civakî hat dayîn. Welîda da xuyakirin dest bi belavkirina alîkariyan li hewcedaran kirine. Welîda da zanîn ku wê alîkarî berdewam bin heta malbatên zirar ji qedexeya derketina derve dîtîn, jê re bên pêşkêşkirin.

## Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêşkêşkirina însiyatîfên mirovî didomin

Piştî belavbûna Koronavîrûsê li gelek welatên cîhanê, Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) ragihand ku vîrûs veguhertiye pandemiyeke cîhanî piştî ku bi hezaran kes pê nexweş bûn û ji ber mirin.
Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di çarçoveya tedbîrên hişyariyê li dijî vîrûsê de 23`yê Adarê qedexekya derketina derve ragihand. Desteya Tenduristiyê ya herêmê heta vê kêliyê ti nexweşî bi vîrûsê belge nekirine.
Bi qedexeya derktina derve re Hêzên Ewlekariya Hundir li tevayiya bajarên herêmê belav bûn. Komîteyên girêdayî Şaredariya Gel û Tenduristiyê kolanên bajaran paqij kirin û dezenfekte kirin û çavdêriya sûkan kirin. Gelek



werşeyên dirûnê însiyatîfên dirûtina maske û lepikan li gel kêmbûna wê dan destpêkirin.
Li bajarê Minbicê bi însiyatîfa Komîteya Jin û koordîneya Komîteya Tenduristiyê werşeya Şehîd Sakîne Eseliye ya dirûnê, dest bi dirûtina maskeyan kir da ku pişt re li endamên Hêzên Ewlekariya Hundir belav bike.

## “Qiran” Bi We Keto?



Idrîs HENAN

Berê li Efrînê dema ku kesek ji kesekî aciz dibû yan jî dayîk ji zarokekî xwe bi hêrs dibû jê re digot: “Qiran bi te keto”. Carinan jî dema ku kesekî fêlbaziyek kiriba bi henekî jê re heman hevok dihat gotin. Dêmekî li gorî pozisyonê peyva “Qiran” hinek kesan ji xwe aciz dike û dixeyidîne û hinekan jî sermest dike ku qaşo karekî baş kirine. Hinek kesên metiryalîst hewl didan li gorî ideolojiya xwe wate li peyvê bar bikin ku dilxwe li dijî ol û baweriyan e. Li gorî mezinan jî, ev idia vala ye û ji bo hinek qezencên siyasî tenê rêbazekî gloverkirina peyvan e.
Li gorî rûspî, zaneyên îtîmolojîk ên gelêrî û hinek ferhengên Kurdî, peyva “Qiran” ji qeyranê hatiye. Ango ji bobelatên ku ji encamên şer û pevçûnan diafirin hatiye. Yanê dema ku kesek ji kesekî re dibêje “Qiran bi te keto” dêmekî; qeyranên curbecur li te bibarin. Li gorî devokiya gelêrî dema mirov ji hinek encaman tengezar dibe ku derveyî vîna wî lê hatine tivîkirin, vê hevokê bi kar tine. Bi rêya wê jî aciziya xwe nîşan dide.
Îro jî tevahî cîhana mirovahiyê li ber gelek cureyên qeyranan e. Bi qeyranê re kêmtedbîrên rejîmên desthilatdar aliyê tendirustî, aborî û civakî ve riswa dibin. Ya girîngtir ew e ku maska sîstema global a hegemoniya navendî bi “Qiranê” re weşiya û nema dikare rûyê xwe yê kirêt bipeçine.
Ji xwe sîstemên han ku li serê mirovahiyê bûne belayek ji ya koronayê mezintir, jêdera hemû derd û êşên mirovahiyê ne. Ango bûne “Qirana” ku bi her liv û tevgerekê xwe nûjen dike ye. Îro jî azar û nexweşiyên mirovahiyê ji ber van sîsteman nexwezayî ne. Her çendî vîrûsa koronayê nola patozan li ber dexlê mirovan ketiye û bi rola giyankêşê firişte “Îzraîl” radibe, nayê wê manê ku korona afirandinekî xwezayî yan narvînek xwedayî ye. Berovajî vê yekê, encamek xwezayî ya serpêhatiya van sîstemên serdest e. Tişta ku vê yekê jî tekez û piştrast dike, rewşa helewela û şerpezebûna van sîsteman li hemberî vê qonaxa kirêtîk e.
Dema ku welatên fena Amerîka, Fransa, Almanya û …. Hwd tevî teknîk û zanista ku pê serê me kun kirine, nikaribin ji hemwelatiyên xwe re devpoşan dabîn bikin, gelo ev sed salin ger ne bi rojek wisa, hûn bi çi mijûl bibûn?. Dema ku kesek nola serokê Çînê derdikeve û serkeftina xwe li hemberî “Qirana” koronayê radigihîne û dibêje; wê berî korona û piştî koronayê neşibin hev, gelo di lêgerîna mirovatiyê ya rastî û heqîqetê de, ev tê çi wateyê?. Lê bersiva serokê Amerîka dema ku digot; pêwîste fabrîkayên endustiryalê ranewestin û ciwan teşwîqî çûyîna kar dikirin, mirov çawa dikare vebêje?. Ger ev sîstem bi xwe ne “Qiran” be, wê çaxê “Qiran” çi ye û bi kê ketiye?.
Otorîteyên jêderên qeyranê îro kirîza lêgerîna xwe ya ji qezenca hov re dijîn. Ta ku xwe jê biparêzin, berê xwe dane rêbazên sedsalên navîn û bi bedena mirovatiyê ketine. Li şûna mijûlbûna bi jiyan mirovan, bi derdê xwe û parastina desthilatdariyê ketine ku bi nirxên mirovahiyê û çandên resen, agirê di bin qoşxaneya “Qiranên” xwe de vêdixin. Hewl didin li ser kirinên xwe yên dermirovî û rûyê xwe yê hov bipeçinin û bi afirandina “Qiranan” têkçûna xwe ya exlaqî binixumînin. Ji lew re; li her derê “Qiranê” belav dikin û bi her kesî dixin. Îro jî mirovatî bi daneheva têgihaştina çandî, exlaq û polîtîk li hemberî van “Qiranên” sîstemên kedxwar li ber xwe dide. Bê guman wê piştî korona neşibe berî koronayê, lê sedî sed jî wê ne li gorî dilê van sîsteman be. Wê “Qiran” bi wan û sîstemên wan keve.